# Rêbernameya Vavêrtina Bermayîyê

KOMAVAHÎYÊŞNÎYÊ



## Bermayîyê xwarinê / Bermayîyê organîk:

Qetên madeyên xwarinê, yên pahtî (pijandî) hem jî yên xav, wekî goştşî, masî û hestî. Qalik û bermayîyên mêweyan û hêşînayîyan, kulîlkê gûlan, xekeya qahweyê wekî fîlter û tilpa çayê.

**Hişlyarî:** Kîsikên kêrhatî yê plastîkî bo paşmayîyê xwarinê û paşmayîyê organîk bikar bînin. Nabe ev tîştane bikevine nava kîsikê: kisikên plastîkî, amanê yekcarî, benîşt, destmala amanşûştinê, mûm, cigare, pêçek, parçe yan axa bin pisîkê.



## Rojname:

Her tiştê ku tê xwandin. Rojname, belavokê katalog, pirtûk û kaxez.

**Hişlyarî:** Paketa kaxezî, destmala kaxezî yan kîsika plastîkî neavêjine nava kaxezan.



## Pêçeka kaxezî:

Vala, Paqij û ta biken!
Qaydûn, kaxeza pêçayî, pêçeka şûştinê, lîvanê kaxezî
Û kisikê kaxezî.

**Hişlyarî:** eger madeyên dî bi qabilîyeta veqetandina hêsan, wek derpoşa pêçî, li nava pêçekê da hebe, vê rakin.



## Pêçeka şûşeyî ya bêreng:

Vala û paqij biken!
Qûtî û botleyê çêbûyî li şûşeya bêreng.

**Hişlyarî:** pêçekan veqetînin. Tenê aman lê ne şûşeyê vexwarinê, ferfûr, lampe, neynûk yan şûşeyên pencereyê.



## Pêçeka şûşeyî ya rengî:

Vala û paqij biken!
Qûtî û botleyê çêbûyî li şûşeya rengî.

**Hişlyarî:** pêçekan veqetînin. Tenê aman lê ne şûşeyê vexwarinê, ferfûr, lampe, neynûk yan şûşeyên pencereyê.



## Pêçeka plastîka nerm:

Vala û paqij biken! Torbeyê plastîkî, pêçanên plastîkî, ka, stîrofom û torikên çêbûyî li plastîka nerm.

**Hişlyarî:** hûrrikên nav da pê hejandinê derxînin. Plastîka nerm bêxîne nava torbeyê nanî, bayê vê derxînin û derê vê girê biden.



## Amûrên Plastîk:

Vala û paqij biken! Qûtî, gomgom, botile û amûrên dî yê ku li plastîka hişk çêbûne.

**Hişlyarî:** Tenê pêçek; ne berhemên dî yê pêkhatî li plastîka hişk, wek boresa amanşûştinê, tawûg û firçe. Dibe botlê ku nîşana vezivirandinê liser hene li destgehê taybet da bêne vezivirandin.



## Pêçekên asn:

Vala û paqij biken! Qûtîyê konservê, borîyên xaviarê, fafon, derpoşên asin, derpoşên botleyan, mûmdank.

**Hişlyarî:** Tenê pêçek; ne emrazên dî yê asin
Wek tabe yan kêr û çengal. Qûtîyê ku li dezgehî da dimînin, veqetînin.



## Bermayîyê elektronîkî:

Amûrên ku wizeya wan bê pîlan yan têla karebayê tê dabîn kirin; wekî sarinc, sobe, stereo, kompûter, jêderên ronahîyê (lampeyên filament, lampeyên halogen, lampeyên kêm-wize û lampeyên flûressent), telefona berîkan û pêlîstankên karebayî.

**Hişlyarî:** Bermayîyê elektronîkî yê mezin wekî bermayîya girse tê kom kirin.Bermayîyê elektronîkî yê biçûk dikarin lu amanên taybet yên Bermayîyê elektronîkî da danên. Dikarin bermayîyê elektronîkî li navenda vezivirandina NSR ê pêşkêş biken.



## Bermayîyê metirsîdar:

Mêşkûj, helal, zeliqûk, dohn, germpîvan, reng.

**Hişlyarî:** dibe ji navendên taybet yê vezivirandina madeyçn metirsîdar anku navendên dî yên jîngehî bêne pêşkêş kirin.



## Bermayîyê girse:

Bermayîyê girse bi sedema mezin bûnê li satilê da cî nagirin, wek kursî, emrazên lêşorxanê û dûçerxe.

**Hişlyarî:** Tevî ku hûn di malê kirê da rûnên, mafê we heye ku bermayîyê girse li malê xwe da rabigirin. Bo bidestxistina agahîyên bştir liser rewşa xwe li ev mijarê da gel xwedîkarê xwe pêwendîyê bigirin. Dikarin bermayîyê girse li navenda vezivirandina NSR ê pêşkêş biken.



## Bermayîyê zêde:

Bermayîyê zêde, bermayîye ke ku paş cûda kirina bermayîya dimîne, wek paketa kaxezî, paçik, ferfûr, potika sabûnê, benîşt, fîlter, birnût, qûma ji bin pisîkan û toza ji tozkêşê (makîneya paqijîyê).

**Hişlyarî:** tenê madeyên ku nayên weqetandin dibe wek bermayîya zêde bêne kom kirin.

## Derman û derzîyê lêdanê:

Dermanê ku hûn werdigirin dibe li torbeytê naylonî yan li torbeyê biçûk ku li alîyê dermanxaneyê tê pêşkêş kirin, bête danan. Derzîya lêdanê dibe li amanên taybet ku li alîyê dermanxaneyê tê pêşkêş kirin, bête danan.

**Hişlyarî:** dermanxane germpîvana bijîşkî qebûl nake, ev bermaîyek metirsîdar tê naskirin.

**NSR® AB,** Hjortshögsvägen 1, 251 89 Helsingborg
**Kundservice:** 042-400 13 40, **fax:** 042-15 37 73
**e-mail:** kundservice@nsr.se, **hemsida:** www.nsr.se

## Çima Vavêrtina?

Vavêrtina bermayîya ser mifaya jîngeh û nifişê pêşerojê ye. Sedema vê divegere ser biserfe bikar anîna jêderên sirûştî bi rêya bikaranîna dubare û heta astekê kêm kirina belvbûna qirêjîyan bi rêya vavêrtin û vezivirandinê, têkildar dibe.

## Navgînên balkeş ku dibe bêne vavêrtina

Tiştên ku dibe bêne vavêrtin, bermayîyê metirsîdarin! Bermayîyê metirsîdar ji wan bermayîya re tê gotin ku eger bi duristî neyên kom kirin û rêveberî kirin, bi mirov û jîngehê metirsî dar dibin. Madeyên kîmyayî, helal, lamp, flûressent, navgînên elektronîkî (wekî giş amûrên karebayî) û pîl li ev bermayîyane têne hesibandin. Dikarin bermayîyê metirsîdar li giş navendên vezivirandina NSR ê pêşkêş biken.

## Bermayîyê Girse?

Dikarin li navenda vezivirandina NSR ê bermayîyên girse, amûrên elektronîkî, paşmayîyê baxevanîyê, bermayîyê metirsîdar, asin, dar û belaş pêşkêş biken.

## Pêçek û rojname

Bi nêrîna me vavêrtina ev navgînane hêsane û gelek rûniştîyê herema NSR ê dikarin pêçek û rojnameyên xwe bidene navendê nêzî avahîyê xwe. Eger we neşêya hûn pêçek û rojnameyên xwe bidene navendê nêzî avahîyê xwe, hûn dikarin wan bidene rawistîngehên vezivirandinê yê derdora şaredarîyê yan yek li navenê cezivirandinê li NSR ê.

## Kêmbûna rêjeya berhem anîna bermayîya

Tişta herî baş bo jîngehê eve ku mirov hindî bikare rejeya berhem anîna bermayîya kêm bike. Eger kinc, navgînên ajpêjê, kursî, dûçerxe û amûrên we yê dî rewşek baş hene, dikarin wan bibene navendên cûda li herema NSRê ku kinc û amûrên bikarhatî dibejirînin, pêşkêş biken.

## Agahîyê taybet bo şênîyên apartmana

Xwedîyê avahî berpirse liser rêveberîya bermayîyê malbatî. Xercê rêvebrîya bermayîya bi pirranî li nirxa kirê yan destheqê rêveberîyê – eger şênîyê apartmana hevkargêrî bin- dê bicî kirin. Lê nêzî avahîya we odeya bermayîya heye ku hûn dikarin bermayîyê xwe bibene vir. Li odeya bermayîya da, satilên taybet bi bermayîya û bermayîyê xwarinê hene. Lê xênjî vê, xwedîyê malê dikare rêjeya vavêrtin û xizmetên vavêrtinê, wekî pêçandin, rojname, amûrê elekteronîkî yê biçûk û pîlê, dîyar biket.

Xwedîyê avahî dibe cîyekê diyar bike daku şênî bikarin bermayîyê mezin û elektronîkî yê xwe daynêne vir. Gelek bermayîyê mezin wekî kursî û asin û dûçerxe, têne vezivirandin.heta beşên elektronîkî jî li bermayîyê mezin têne veqetandin. Bermayîyê mezin yê ku nayên zivirandin wekî doşek û ferşî dibe li odeya cûda ji bermayîyê vezivirandinê bêne ragirtin. Eger pêwîst be ku we amûrên bêtir bo vavêrtina bermayîya li mala xwe da hebe, gel xwedî mala/ê xwe yan yekîneya avahîyan pêwendîyê bigirin.

**NSR® AB**
Hjortshögsvägen 1, 251 89 Helsingborg
Växel: 042-400 13 40, fax: 042-15 37 73, www.nsr.se